

## Agahdarî derbarê SNQ- (Qeyda kalîteyê ya nûzayan li Swêdê)

### Ji bo te yê ku zarokê te li beşa nûzayan tê tedawî kirin.

Lênêrîna nûzayan ya Swêdê li cîhanê ya herî baş e, lê ev lênêrîn û netîceyên wê dikarin hêj bîn baştir kirin. Qeyda kalîteyê ya nûzayan (SNQ) li Swêdê qeydeka kalîteyê ya lênêrîna nûzayîna ya seranserî welatî ye. Pêşvebirin û garantîkirina kalîteya lênêrînê armanca SNQ-yê ye. Hemû beşên nûzayan li Swêdê qebûl kiriye ku agahdarîyan yê derbarê wan zarokan yê ku li beşê nûzayan tîn tedawî kirin bidin SNQ-yê. Di dema lênêrînê de, hin agahdarî derbarê bihalbûnê û zarokbûnê û derbarê rewş û çareserî û teşxîsên zarokê te dê ji bo SNQ-yê bîn hewale kirin. Ji bo wan zarokan yê ku hewcedarîya wan bi lênêrîneka hêj berfirehtir heye, agahdarî derbarê serdanên berdewam yê şopandinê rewşê jî ji bo SNQ-yê tîn hewale kirin.

### Alîkarîya te lênêrîna baştir dike

Beşdarbûna zarokê te di qeyda kalîteyê ya seranserî lênêrînê baştir dike. Çi qas zêdetir zarokê te de başdar bin, ew qas lênêrîn temîntir û bitesîrtir dibe. Agahdarîyên ku di SNQ-yê de hene ji bo karê baştirkirinê tîn bi kar anîn û bi alîkarîya agahdarîyên qeydê îmkânên pir bibiha ji me re çêdibin ku em bibînin ka kîjan awayên karî û rêyên çareserîyê û kîjan derman û berhem netîceyên baş didin zarokê te yê nexweş. Beşdarîkirin bi dilxwazî ye.

### Agahdarîyên zarokê te weha tîn miamele kirin

Agahdarî ji nexweşnameya zarokê te û ji te ku tu dayik yan bav yan welîyê zarokî yî tîn civandin. Hin agahdarî ji rapora zarokbûnê ya dayikê jî di nav SNQ-yê de ne. Mîmkîn e ji te bê xwastin ku tu pirsnameyeka taybetî dagirî da ku agahdarî derbarê çawanîya birêveçûna lênêrîna nûzayan û lênêrîna giştî bîn civandin. Divê ev agahdarî tenê ji bo pêşdebirin û garantîkirina kalîteya lênêrînê û berhevkirina statistîkan û ji bo lêkolînê di warê tendirustî û lênêrîna nexweşan de bîn bi kar anîn.

Çêdibe ku agahdarî teslîmî wî kesî bîn kirin yê ku dê wan ji bo armancekê ji wan sê armancan bi kar bîne piştî ku lêkolîn li ser dereceya sirveşartina wî tê kirin.

Agahdarî ya ku mîmkîn e ji SNQ-yê here derve dê elektronîk here. Gava agahdarîyên ji SNQ-yê bibin madeya lêkolînê zanistî, hertim pêwîst e ku Heyeta lêkolîna pirsên exlaqî qebûl bike.

### Sirveşartin

Agahdarîyên zarokê te dikevin nava çarçoveya sirveşartinê li gor. Ango, qaîdeya serekî ew e ku heqê SNQ-yê heye agahdarîyên derbarê zarokê te bide kesekê din tenê herger misoger be ku ne zarokê te ne jî mirovekê zarokî dê zerardar bibe heger agahdarî herin derve. Agahdarî yê ku tîn rapor kirin bi hîç kesê diyarkirî ve nayên girê dan. Tenê datayên civandî tîn nîşan dan.

## **Emanet û ewlehî**

Agahdarîyên zarokê te ji kesên neeleqedar parastî ne. Hin şertên taybetî hene ku dibêjin agahdarî tenê ji wî kesî re tên dan yê ku jê re lazim in û divê kontrol bê kirin ku agahdarî negehin kesên neeleqedar û agahdarî bi rêya şifrekirinê bîn parastin û divê login ji bo dîtina agahdarîyan bi awayekê ewle û emîn be.

## **Dîtina agahdarîyan**

Heqê lînêrê zarokê te heye ku wan agahdarîyan yê ku ew didin SNQ-yê bibînin. Ji xeyrî wî lînêrî kesê din agahdarîyan nabîne. Kesên ku li navenda SNQ-yê dixebitin dikarin û heqê wan heye ku agahdarîyên zarokê te bibînin.

## **Jêderxistin**

Ji bo pêşdebirin û temînkirina kalîteya lînêrîna, agahdarîyên zarokê te tên avêtin gava êdî hewcedarî pê nemîne.

## **Hiqûqên zarokê te**

- Beşdarbûna zarokê te di SNQ-yê bi dilxwazî ye û tesîrê li lînêrîna wî nake. Heger tu nexwazî agahdarîyên zarokê te bîn qeyd kirin, têkilîyê bi doktorê berpirsîyar bike.
- Her gav heqê te heye ku tu agahdarîyên zarokê ji SNQ-yê bidî avêtin.
- Tu dikarî daxwaz bikî ka kê û li kîjan navenda lînêrîna û di kîjan demê te agahdarîyên zarokê te dîtine.
- Heqê te heye ku bedela zerarê bixwazî heger agahdarîyên zarokê te ne li gor qanûna agahdarîyên şexsî bîn bi kar anîn.
- Tu dikarî daxwaza rastkirinê bikî heger agahdarîyên zarokê te ne li gor qanûna agahdarîyên şexsî hatibin bi kar anîn.
- Heqê te heye ku tu di salê de carekê belaş bizanî ka derbarê t zarokê te kîjan agahdarî hatine qeyd kirin (ku beyannameya qeydê jê re tê gotin). Divê daxwaznameyeka weha nivîskî be, îmzekirî be û ji bo karmendê têkilîdarîyê yê SNQ-yê bê şandin. Navnîşana karmendê têkilîdarîyê di [www.sng.se](http://www.sng.se) de ye.

## **Berpirsîyarê agahdarîyên şexsî**

Ji bo her qeyda kalîteyê daîreyeka navendî ya ku ji agahdarîyên şexsî berpirsîyar e - û piraniya caran meclîsa parêzgehê ye - heye. Meclîsa parêzgeha Västerbottenê ji SNQ-yê berpirsîyar e. Heger tu agahdarîyên zêdetir bixwazî, tu dikarî vegeerî doktorê zarokê xxwe yan zêdetir di malpera [www.sng.se](http://www.sng.se) de bixwînî.

### **Mikael Norman**

Enheten för Pediatrik, CLINTEC

Blickagången 6A

Karolinska Institutet & Karolinska Universitetssjukhuset

141 57 Stockholm

SWEDEN